Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

Hejmar (527)
2026-10-07

www.agirimedia.org



DI VÊ HEJMARÊ DE:

Rojev 7
Hevpeyvîn 8
Civakî 10
Mafê Mirov 11
Poster..... 12

Kurd bi hemî pîvanên netewebûnê, Netewe ye



Netewebûn pênaseya bilindtirîn a piştrastkirina hebûna siyasî, çandî û erdnîgarî ya gelan e.

Dema em behsa Kurdan dikin, em behsa neteweyekî xwedî hemû taybetmendiyên netewebûnê dikin, ne tenê komeke "êtnîkî" an kêmaniyek, hevgirtina dîrokî, zimanê hevpar, çanda xweser, erdnîgariya diyarkirî û daxwaza siyasî ya azadiyê û gelek mijarên din, pênaseya neteweyî ne û li belgename û pejirandiyên navnetewî de jî weke mafek hatiye diyarîkirin.

Lê belê, dewletên serdest û neyarên gelê Kurd tu carî amade nînin ku bi fermî êtirafê bi netewebûna Kurdan bikin. Ev redkirin ne ji ber kêmasiya belgeyên dîrokî an zanistî ye, belkî xwedî armanc û stratejiyên kûr ên siyasî ye. Dema ku neyar Kurdan tenê wek Êtnîk an eqeliyyet pênase dikin, hewl didin mafê çarenivîs û desthilatdariya siyasî ji destê Kurdan derxînin. Ji ber ku li gorî yasaya navneteweyî, mafê avakirina dewletê an mafê diyarîkirina çarenivîsê mafê neteweyan e, ne mafê kêmnaniyên êtnîkî, lewra hikûmet û neteweyên serdest û neyarên Kurdan gelek bi hişmendî naxwazin netewebûna Kurdan bînine ziman. Neyar dixwazin doza Kurd ji meseleyeke siyasî û neteweyî daxînin asteke mafên çandî an herêmî yên piçûk.

Bo Kurdên Rojhilatê Kurdistanê, ev siyaset xwedî dîrokekî sedan sale ye. Rejîmên serdest ên li Îranê, çi di serdemên berê de û çi jî niha, her tim daxwazên sereke û berheq ên neteweyî yên gelê Kurd li Rojhilat wek cudayîxwaz, metirsî bo ax û ewlehiya welat, an projeyên biyanî binav kirine. Armanca siyasî ya rejîmê li Îranê de li hember Rojhilatê Kurdistanê ew e ku nasnameya Kurdî di nav îdeolojiya dewlet-netewe ya navendî de bihelîne. Ew dixwazin Kurdan tenê wek gelekî Îranî yê xwedî folklorekî herêmî nîşan bidin, da ku ti daxwazeke siyasî ya ji bo xwerêveberî, federalîzm an mafên neteweyî yên heqîqî ser negire.

Di encamê de, têkoşîna Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê ne tenê ji bo mafên zimanî an çandî ye, belkî berxwedanek e ji bo parastina nasnameya neteweyî. Ji ber vê yekê, pênasekirina rast a Kurdan wek netewe, stûna bingehîn a têkoşîna siyasî û rizgarîxwaziya Kurd e.

Cudaxwazî, tohmetek ewlekarîyê bo ji hole rakirina daxwazeke siyasî



Mijara vê rûpelê derbarê gelo dibe ku Îranek were avakirin ku hemû gel û civakên wê xwe wekhev, xwedî maf û beşdarê desthilatê bibînin‹Ji aliyê Rêzdar Kawe Ahengerî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 2

Rewşa çalakîyên nifşa nû di urmîyê de



Mijara vê rûpelê derbarê çalakî û hişyariya nifşa nû ya Kurd li Urmiyê ye‹Ji aliyê Rêzdar Hemîd Çepatî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 4


Paşvekêşeya Îdeolojîk



Mijara vê rûpelê derbarê "Can Feda" û bikaranîna jinan ji aliyê rejîma Îranê ve ji bo armancên siyasî û ideolojîk e‹Ji aliyê Xatûn Aso Minberî ve hatiye nivîsandin.

RUPELA 3

Cudaxwazî, tohmetek ewlekarîyê bo ji hole rakirina daxwazeke siyasî



N. Kawe Ahengerî



Li wêjeya siyasî ya Îranê de, kêm peyv hene ku bi qasî peyva «cudaxwaz» bûbin etîketek bo bêîtibar kirina neyar û xebatkarên siyasî. Ev peyv, bi taybetî li wêjeya hêzên navendparêz, padîşahîxwaz û Komara Îslamî de, piraniya caran ne bo pênasekirina bernameyeke siyasî ya diyar, belkî bo jibîrbirina eslê pirsê û bêdengkirina daxwazên neteweyî, zimanî û siyasî yên kurd, beluç, ereb, turk û neteweyên din yên ne-fars hatîye bikaranîn.

Xala giring ew e ku divê di navbera cudaxwaziyê wek projeyeke siyasî û daxwaza wekhevîyê, xwerêveberîyê, federalîzmê, nenavendîbûnê an mafê beşdariya wekhev di avahiya siyasî de ferq bê kirin.

Her daxwazek bo dabeşkirina desthilatê di navbera navend û herêman de, bi wateya hewldana bo perçekirina Îranê nîne. Heta di dîroka hevçax ya Îranê de jî serkirde û partiyên cuda yên kurd gelek caran li ser çareserkirina pirsa Kurdistanê di çarçoveya Îranê de tekez kirine.

Bo mînak, di mehên yekem yên piştî şoreşa 1979an de, heyeta nûneratiya Kurdistanê ligel heyeta hikûmeta demkî ya ji Tehranê hatibû şandin, di derbarê mekanîzmaya dabeşkirina desthilatê di çarçoveya plana xudmuxtariyê de gelek caran civîn û danûstandin kirin. Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê jî bi rêberiya Dr. Ebdulrehman Qasimlo heta dema ku li Viyanayê ji layê dîplomat-terorîstên Komara Îslamî ve hat terorkirin, xudmuxtarî wek çareseriyeke siyasî dixist ber çavan.

Ji vê dîtinê, «cudaxwaz» wê demê dibe tohmet û tawanbariyekî ewlekarîyê ku di cihê vekolîna ser bername, armanc û belgeyên tevgereke siyasî de, tenê nasnameya neteweyî an daxwaza siyasî ya wê tevgerê bibe bingeha tohmetê. Belgeyên hatine weşandin di derbarê çalakiya SAVAK û Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê de nîşan didin ku dezgeha ewlekarîyê ya Pehlevî çalakiya vê tevgerê di çarçoveya dosyayên ewlekarîyê de tomar dikir.

Ji ber vê yekê, mirov dikare bibêje wêjeya ewlekarîyê ya di derbarê «perçekirinê» de xwedî dîrokeke micid e di sîstema siyasî ya berî Komara Îslamî de, her çend îdîaya ku ev peyva «cudaxwaz» cara yekem ji layê SAVAKê ve hatîye çêkirin, hewcehiya wê bi belgeyên dîrokî yên diyartir heye.

Lê cudahiya mezintir li cihê din e: Kê bi rastî di derbarê «perçekirina Îranê» de diaxivin û kê di sedsala borî de di pêgeha desthilatê de di derbarê sînorên Îranê de biryar dane?
Rast e ku heke em nîqaşê tenê li ser dîroka axê rêve bibin, gelek ji veqetînên axê yên herî giring yên Îranê heta berî avabûna dewleta Pehlevî rû dane.

Peymanên Gulistan û Turkmençayê di serdema Qacaran de bûn sedema ji destdaneke mezin ya axa Qefqasyayê. Di serdema Pehlevî de jî Îranê di sala 1971ê de dest ji îdîaya serweriya li ser Behreynê berda, biryarek ku piştî lêkolîna Neteweyên Yekbûyî di derbarê daxwaza gelê Behreynê û erêkirina wê di parlementoya Îranê de hat girtin.

Ji ber vê yekê, bikaranîna dîrokê bo tohmetbarkirina xebatkarên neteweyî bi «cudaxwaziyê» hewcedarî bi baldarîyeke pir mezintir heye. Heta di derbarê peymana Cezayirê ya 1975an de jî wêneya dîrokî ji çîrokên belavbûyî aloztir e: Ev peyman di beşek ji sînorê Îran û Iraqê de, prensîba xeta “Talog” wek sînorê çemê Şetulerebê pejirand û li beramber de, Îranê piştevaniya xwe bo serhildana kurdên Iraqê rawestand.

Yanî biryarên têkildarî sînor, ewlehî û yekparçeyiya axê herdem ne encama reftara «xebatkarên neteweyî» bûn, belkî bi piranî di asta hikûmet û desthilatên navendî de dihatin girtin.

Pirsa din, hevdema ecêb ya vê tohmetê ye di du aliyên peywendiya navendparêz de.

“Komara Îslamî û beşek ji cereyana padîşahîxwaz, tevlî cudahiyên xwe yên bingehîn di derbarê forma hikûmetê de, di wêjeyeke hevbeş de, xebatkarên herêmên neteweyî bi navê «cudaxwaz» bi nav dikin. Ev nêzîkbûn helbet bi tenê îspat nake ku tohmet şaş e; lê nîşan dide ku ev peyv dikare ji bilî ku pênaseyek rast ya siyasî be, bibe amrazek hevbeş bo parastina navendîkirina desthilatê.”

Di dawiyê de, pirsa Îranê tenê ev nîne ku kê «cudaxwaz» e; pirsa bingehîntir ev e ku çawa pêkhateyeke siyasî dikare bibe asteng li ber qutbûna civakî û axî?
Yekparçeyiya domdar bi gefê, sivkatî, înkarkirina nasnameyê, navendîkirina desthilatê û ewlekarîkirina daxwazên siyasî neyê çêkirin. Yekparçeyî wê demê domdar dibe ku welatîyê kurd, beluç, ereb, turk, turkmen, fars û welatîyên din yên Îranê hîs bikin ku welat ya hemûyan e, ziman û çanda wan rêzdar e, desthilata siyasî di destê navendekê de nîn e, û ti grûpek bo bidestxistina mafên wekhev neçar nîne ku destpêkê nasnameya xwe înkar bike.

Ji vê dîtinê, rêya rûbirûbûna li gel cudaxwaziyê ne tepeserkirina daxwazan e, avakirina dewletekê ye ku welatîyên wê ti sedemekê nebînin bo veqetîna ji wê.

Heke biryar be em ji «yekparçeyiya axê» biparêzin, divê em hevdem ji «yekparçeyiya mafên kesane û giştî» jî biparêzin. Yekparçeyiya axê bêyî dadwerî, azadî, beşdariya siyasî û dabeşkirina dadwerane ya desthilatê, belkî bo demkî bi zorê bê parastin, lê bi zorê nabe sedema hevgirtineke giştî.

Îrana pêşerojê, heke biryar be yekparçe bimîne, ne bi tirs pênasekirina ji «cudaxwazan», belkî bi baweriya di navbera netewe û civakên pêkhatî yên wê de, dabeşkirina desthilatê, wekheviya mafan û pejirandina pirrengiyê dikare yekparçeyiya xwe biparêze.

Ji ber vê yekê, pirsa rastî ne «cudaxwaz an nîştimanperwer» e; pirs ev e: Ma mirov dikare Îranekê çêbike ku hemû rûnîştvanên wê xwe di wê de wekhev, xwedîmal û şirîkê desthilatê bibînin?

Paşvekêşeya Îdeolojîk



N. Aso Minberî



Pênasa jinê li cem Komara Îslamî, bi berdewamî rengvedana îdeolojiya zal û klişeyên zayendî yên baviksalarî bûye. Di heyama zêdetir ji çar dehkên borî de, vê rêjîmê hewl daye ku pênasa jinê bi komeka rolên nerîtî û xêzanî ve girê bide û her cûre beşdariya bandora jinê di qada siyasiyî, leşkerî û bi gştî aktê serbixwe yê jinê de, bi taybetî di çarçoveya rêxistin û hizbên siyasiyên opozisyonê de, wekî reftaraka “dijîjin” yan “dijîbav” û gelek caran jî “dûr ji siruşta jinê” yan “mêrane” nav bibe.

Bi vê armancê, dezgehê propaganda yê rêjîmê û perwerdeya îdeolojik a qutabxanyan jî roleke berçav gêřane, belê, ti ji wan neşiyane paşekşê bi xwestek, daxwaz û ji hemûyan giringtir şêwazê bîrkirina azad a jinan bigrin.

Li gel wan hemû hewlan ku bi hezaran dolar pere jî bo hatine xerckirin, îro em dibînin ku birêvebirina komeka çalaki û gelaleyên wekî “Can Feda” û bangewaziya gştî bo organîzekirina jinan di çarçoveya yekeya leşkerî, dermankirinî û lojîstikî de, perde ji ser duferhengiya (durotiya) zeq û aşkera û di heman demê de, paşekşeya rêjîmê ji behayên xwe dûr keve!

Deshelatek ku 48 sal e hewla piştguhxistina jinan dide û tepeseriya wan dike, niha di gupka bêçarebûnê de, hawara xwe biriye ber heman wan kesên ku wekî mirovên pile çend jî nehesibandin. Ev yek wê rastiyê dide diyarkirin ku rêjîm di perîşaniyeke kûr de ye. Yan çi dikare bibe sedem ku deshelatek îro bi wî şêweyî stayişa şiyan û jêhatibûna jinan bike?!

Di demên borî de, navendên serkutker yên Komara Îslamî terhek bi navê terhê “Can Feda” xistine warê cîbcîkirinê. Ev gelale ku ji layê navendên çekdar yên rêjîmê ve dest bi kar kiriye, amanca wê ewa ye ku hêza civakî, bergirî û dermankirinê ya rêjîmê di rewşên qeyranî de rêk bixe. Ev gelale du aliyên sereke hene: Ya yekê layenê leşkerî û medenî ye ku pêkhatî ye ji rakêşana hêza xobexş di çarçoveya “Gurdana Bergiriya Millî ya Can Feda” li ser bingeha fêrkirina rezmî, bergirî û ewlehiyê û di dawiyê de beramberkirina gel li gel gel. Layenê dî jî layenê lojîstikî û dermankirinê ye ku pêkhatî ye ji pêkanîna dehan hezar yekeyên herêmî bo alîkarîgihandin û rizgarkirinê ku bi hevkarî û piştgirîya Heyva Sor birêve diçe.

Xala berçav di vê gelaleyê de beşdariya berçav a jinan û mifah wergirtin ji jinan wekî kalaya rêklamê di rêza yekê ya tomarkirina nav û organîzekirinê de ye. Rêjîm bi fermî daxwazê ji jinan dike ku di çarçoveya vê gelaleyê de, fêrî bergiriyê bibin û wekî mertalekî piştîvan, di kolan û taxan de, rol bileyîzin.
Ewa ku jin di qada bi evî cûreyî de xwe bibînin û rol bigêrin, di esla xwe de ne xirap e û ne-asayî ye, belê demê deshelatek wekî Komara Îslamî behsa wê dike, cihê baldanê ye!

Komara Îslamî ji destpêka hatina ser deshelatê ve, siyaset û perwerdeya xwe ya civakî li ser bingeha bindestkirina jinan ava kiriye. Di vê proseya demdirêj a îdeolojîk de, jin ji qada biryardanê hatine bêparkirin, û destgehiştina wan bo berpirsiyariyên bilind yên siyasiyî û dadweriyê û heta biryardanê jî jê hatiye zeftkirin, û yasayên wî welatî jî li ser bingeha newekheviya mafên jin û zêlaman hatine darêjtan.

Dezgeh û navendên ewlehiyê yên rêjîmê jî berdewam hewl dane ku beşdariya jinan di grûpên xebatker de wekî reftareka nekêrhatî pênase bikin ku her jinaka gav havête nav wê rêyê, karê wê wekî jirê derkeftina giran a civakî bête pênasekirin. Çimkî ji dîtina îdeolojiya zal ve, divêt jin ne xwedî îrade, serbixweyî û hêz bit!

“Giringtirîn xala vê beramberbûnê di şoreşa Jînayê de hate dîtin. Dema jinên Kurdistan û Îranê bo standina nasname û mafên xwe yên bingehîn hatine ser kolanan, bersiva deshelatê ne bihîstina daxwazan bû, belku tundtirîn cûrê tepeseriyê, desteserikirina berfireh û guleşdan di çavan de û standina canê wan bû.”

Berhevkirina reftarên rêjîmê li gel jinan di rewşa asayî û rewşa qeyranî de, duferhengiya îdeolojîk a vê deshelatê bi hêsanî diyar dike.

Ev bangewaz di gava yekê de, êtirafa rêjîmê ye bi hêza jinan, rêjîm têgehiştiye ku jin dikarin bibine hêzeka pêşeng di guherînên civakî û siyasiyên Îranê de. Ji vê rexê ve, bi rêya gelaleyeka wekî gelaleya “Can Feda”yê diwêt, hêz û şiyanên wan bixe xizmeta îdeolojî û xwestekên xwe da ku bigehe amanca xwe ku “man” a li ser desthilatê ye.
Ji aliyekî din ve, paradoksa aşkera ya ewlehiyê tê dîtin. Di demekê de ku jinên Kurdistan û Îranê bo azadî û wekheviyê xebatê dikin yan bo bergiriya ji xwe çekê radikin, reftara wan ji aliyê rêjîmê ve wekî “tawan” yan “reftara dijîjin” û “derketin ji rolê nerîtî” tê pênasekirin, belê demê rêjîm dikeve ber xeteriya herfînê, heman reftara berevaniyê û amadebûna jinan di kolanê de, wekî can fidakirin û cîhada pîroz nav lê tê nan.

Ev reftara durotiyê nîşan dide ku çavkaniya klişeyên zayendî yên rêjîmê, bawermendbûn bi reftar yan olekî neguhêr nîne, belku pirseka hevaheng e di rastiya berjewendiyên siyasiyên rêjîmê de.
Gelaleya “Can Feda” di rastiyê de ne nîşana hêza rêjîmê ye, belku nîşaneya şikesta îdeolojiya 48 salî ku di bin sîbera wê de, siyasets “helandina jinê” û berçavkirina klişeyên zayendî dihate peyrewkirin. Deshelatek ku bi salan hewla wê ew bû ku jinê wekî tiştekî bêhêz, bêîrade û destewestan pênase bike, îro hawar biriye ber wê rastîn ku îsbat dike hêza rastîn di destê jinan de ye.

Jinên Kurdistan û Îranê bi rêya xebat û rû bi rûbûna li gel vê îdeolojiyê, bihayek mezin dane û ezmûna tepeseriya xwînawî ya şoreşa Jînayê û nerazîbûnên rêbendanê hene û ev yek wisa dike ku di beramberî vê plana gemar a rêjîmê de, bi hişyarî gavan bihêlin. Ew baş dizanin deshelatek ku mafê jîyan û azadiyê ji jinan zeft kiriye, qet nikare bibe berevankarekî baş bo mafên wan. Ewa ku îro rêjîm destê xwe havêtiye ber jinan, tenê diçe çarçoveya dawî cehdên sîstemekî ber bi herfînê ku naxwaze heqîqeta civakê bibînît!

Rewşa çalakîyên nifşa nû di urmîyê de



N. Hemîd Çepatî



Meseleya Urmiyê ji tevahiya erdnîgariya Kurdistanê cuda nîne, ji Makuyê heta Îlamê binêşeya vê pirsê û nêrîna desthilata navendî beramberî civaka Kurd yek e. Tiştê ku di van hemû salan de li ser axa Urmiyê qewimî, parçeyek ji projeyeke firehtir û endezyarîkirî bû ji bo zeftkirin, paşvexistin û înkarkirina gav-bi-gav a nasname û wijdana neteweyî ya Kurdî.

Lê tiştê ku Urmiyê ji bajêrên din cuda û aloztir dik e, cûdahiya piralî ye ku tê de ziman, ol û netewe dest dan destê hev da ku xelkê vê herêmê ji mafê rêveberiya bajêr û axa bav û kalan bêpişk bihêlin.

Di salên şêst û heftêyan de, anku di dema bab û bapîrên me de, asta xwendin, perwerde û zanebûna siyasî ne mîna ya îro bû. Civaka Kurd li Urmiyê ji ber fişarên siyasî û tirsê, heta astekî mezin qebûl kiribû ku ew hemwelatiyekî pileya duyem e.

Zimanê îdarî, bazar, dermanxane û rêveberiya hemû saziyên bajêr di destê Azerîyan de bû û Kurdan ji bo birêvebirina jiyana xwe ya rojane divê bi zimanê wan biaxivtiban.

Wî çaxî heke di navbera cîranan de pirsgirêk an alozî jî nehatiba dîtin, ne ji ber dostînî û wekheviya rastîn bû, belkî ji ber wê yekê bû ku aliyê kurd bi tevahî bêdeng bibû, dest ji nasnameya xwe berdabû û daxwaza mafên xwe nedikir.

Lê belê di cîhana siyasî de ti civak bo hemêşe di bin tariyê de namîne. Ji dawiya salên heftêyan û destpêka salên heştêyan de, rûpelekî nû di dîroka bajêr de hat vekirin. Komên piçûk ên ciwanan mîna saziya «Andîşey Ehmedê Xanî» û koma «Ferzanegan» ava bûn.

Ciwan, rewşenbîr û xwendekarên zanîngehê hatin cem hev da ku li ser çand, helbest, şano û giringiya parastina zimanê Kurdî biaxivin.

Van pêngavên piçûk, pêleke mezin a hişyariyê di nav civakê de da destpêkirin ku çalakî û azadiya ramanî ya îro ya Urmiyê deyndarê wan rojan e. Dîsa jî bi xurtbûna van çalakiyan re, çavdêrî, zext û hesasiyetên ewlehiyê yên rejîmê jî roj bi roj li ser çalakvanan zêdetir bûn.

Gava rêyên çalakiyên çandî hatin girtin, nuxbeyên siyasî yên wî çaxî biryar dan ku şansê xwe di pîvanên fermî û sindoqa dengdanê de biceribînin.

Komên cûda yên siyasî hatin ava kirin û hemû girîngî û hêza civakê dan hilbijartinên meclîs û şûrayê. fikir û nêrîna giştî ew bû ku bi rêya sindoqê dikarin hebûna xwe ya demografîk îspat bikin û li ber pêla tundraw a înkarê bisekinin.

Ji bo ku di nav sîstemê de werin qebûlkirin û mohra cudaxweaxî û terrorîst bûnê li wan nekeve, hewl dan cil û bergên fermî yên rejîmê li xwe bikin, li ser Îranîbûn û parêzvaniya sînoran tekez bikin da ku nîşan bidin ku ew ne mêvan in û xwediyê axê ne.

Lê sîstemê bi ti awayî nexwest Kurdan di rêveberiyê de qebûl bike û komên tundraw jî bi tohmetbarî û zextên ewlehiyê, girtin û binçavkirin zêdetir kirin.

Tevî van hemû astengiyan jî, hilbijartin dîsa mîna yekane qada çalakî û desthilatê dihat dîtin. Lûtkeya vê xebata siyasî di meha Adara 1402an de çêbû ku gelê Kurd di vê herêmê de karî du nûnerên Kurd ji bajarê Urmiyê bişîne meclîsê û bi coş û şahiyeke mezin birjêne kolanan.

Xala herî girîng û dîrokî ya vê tevgera bîst salan, cejna Newroza 2025an (1404) bû, ku sedan hezar kes dest bi destê hev li dilê Urmiyê civiyan, awazên Kurdî gotin û cejn pîroz kirin. Ev civîna bêhempa dengê hebûna gelekî zindî gihand hemû cîhanê û nîşan da ku nasnameya Kurdî ji vê herêmê nayê jinavbirin.

Lê rast piştî van serkeftin û hêza medenî, fişar û zordariya nerm a desthilatê çend qat zêdetir bû. Tevî ku Kurdan 7 nûner ji 12 nûnerên parêzgehê û 2 nûner ji 3 nûnerên Urmiyê di dest de hebûn û hemû mercên fermî qebûl kiribûn, dîsa jî ji rêveberiya parêzgehê û biryardanê hatin dûrxistin.

“Rûyê bajêr di hemû festîval û bernameyên fermî de bi tevahî hat Azerîkirin û heta destûr nedan çalakiya herî piçûk a sembolîk jî çêbibe.Nêrîna kûr li van çend salan nîşan dide ku rêbaza nêzîkbûna ji sîstemê û dilxweşkirina bi sindoqa dengdanê, ziyanên wê pir zêdetir bûn ji sûdên wê.”

Ziyana herî mezin ew bû ku ciwan ber bi guhartina ramanî ve kişandin, ruhê berxwedanê li hember asîmîlasyonê lavaz kir û civak ji ramana resen a Kurdî dûr xist. Sîstem li ser bingehê înkarkirina Kurdan hatiye ava kirin û bi rêya sindoqê ti mafekî rastîn nade me.

Bi kêfxweçî ve nifşê nû û hişyar a îro, ji ev lîstika rejîmê û ji xeyala guhartina bi rêya sîstemê derbas bû.

Îro em dibînin ku çalakîyên serbixwe yên çandî ava dibin, bername û platformên nû mîna «Telik» û «Biryar» nimûneyên diyar ên vê guhartina ramanî ne ku rêya xwe bi tevahî ji sîstemê cuda kiriye û bêyî destûra desthilatê pêş de dibin.

Li kêleka wan, civînên pirtûkxwendinê di nav mal û civatên serbixwe de tên li dar xistin. Tîmên çiyageriyê ava dibin da ku gund, lûtke û navên resen ên erdnîgariya herêmê ji nû ve nas bikin û biparêzin, û grûpên cûda yên muzîka resen û nûjen dengê xwe digehînin ciwanan.

Nifşa nû gehiştiye vê baweriya kûr ku rêya gihîştina bi rûmetê, naskirina nasnameyê û bidestxistina mafan, bi ti awayî ji korîdorên îdarî yên Tehranê an ji sindoqên bê-desthilat derbas nabe.

Rêya rizgariyê di vegara li koka resen a nasnameya Kurdî, xwe-baweriya civakî, çêkirina naveroka çandî ya serbixwe û bilindkirina hêza medenî de ye.

Urmiye dîsa li ser riya dîtina ruhê xwe yê pêşeng de ye. nifşek di rê de ye ku bi bawerî bi zanîn, torên civakî yên serbixwe û çalakîyên sivîl, mafê jiyana wekhev û nasnameya xwe di vê axa dîrokî de pêk tîne.

Piştederkirina dîplomatîk an selimandina hêzê?



N. Serbest Urmiye



Şiroveyek li dor fermana Marco Rubio li dijî Ebas Eraqçî

Amadebûna şandeyên dîplomatîk li Civîna Giştî ya Ciwata Neteweyên Yekbûyîê her tim derfetek bûye ji bo wekirina koregirêyên ser riya siyaseta cîhanî. Lê ya ku vê carê li “New York”ê qewimî, weke guherîneke berguman di deb û nerîtên dîplomasiyê de tê şirovekirin.

Fermana ku tête gotin ji aliyê “Marco Rubio”, Wezîrê Derve yê Dewletên Yekbûyî ve bûye”, ji bo derxistin û piştederkirina pêşwext ya şanda rêjîma Îranî bi serokatiya Ebas Îraqçî wezîrê derve yê rêjîma Komara Îslamiya Îranê, ne tenê pêngavek protokolî ye ya dîplomatîk, belku kiriyareke siyasî ya pir-alî ye ku hem rê û terzên danûstandinan li Waşîngtonê eşkere dike û hem jî pêşeroja berevaniyên di navbera her du aliyan de ber bi hêleke ber bi guman ve dihajo.

Fermanek ku hevdem bû digel daxuyaniya Serkomarê Amerîka Donald Tiram ku ragihand pêşniyar û şertên rêjîma Îranê bo wekirina tengava Hormozê red kiriye û ragihand ku ti danûstandinekê digel rêjîma Îranê de nake û mercên wan qebûl nake.

Aliyên siyasî yên vê fermanê

1. Mifah vergirtin ji dîplomasiyê weke emrazê zexta derûnî

Fermana han ya berpirsên Amerîkayê û bi taybet bi biryara wezîrê karên derve yê Amerîka yê ve, dikare wekî nîşaneyeke zelal ji aliyê Waşîngtonê ve bo Tehranê were dîtin, bi vê wateyê ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîka, ne amade ye ku tenê ji ber amadebûna asayî ya berpirsên rêjîma Îranî di Civîna Giştî ya Netewên Yêkbûyî de, pêvajoya danûstandinan bê hebûna çi destkevteke berçav bidomîne.

Ev kiriyara han dikare hewldaneke eşkere be ji bo jordebirina asta bihaya siyasî di hegera sernekewtina pêvajoya danûstandinan û zextkirin li Tehranê da ku bi terzeke hêmintir ji caran li ser maseya danûstandinan amade be.

2. Metirsî li dor hilweşîna yekcarekî a pêvcajoya danûstandinan

Nîgeraniya sereke ne fermana derêxistin û piştederkirinê bi xwe ye, belku ev kiryare dikare hilgirê peyamekê be li dor rewşa peywendiyan di navbera her du welatan de.

Dema ku danûstandinên li ser Tengava Hormuzê, bidawîhatina pevçûnan û dosyaya navkî di rewşek neçareser kirî de sekinîne, biçûkkirina hevdu, tundtirbûna zimanê diyalogê û nemana baweriyê, meydana ji hev têgihîştina li hev tengavtir dike.

3. haydariyeke metirsîdar ji bo aliyên navbenkar

Xala ku di vê bûyerê de pitir cihê tiresê ye, haydariyeke ji bo aliyen navbendçî. Li gor nûçeyên derbarê sekinandina pêvajoya danûstandinên ku ji aliye dewleta Qeterê ve dihatin navbijîvanîkirin, xuya dike ku her du aliyên Amerîkayî û rêjîma Îranê, di asteke berfirehtir ji hev bi guman in û li rastî de baweriyê bi hevdu nakin.

Di rewşeke wiha de, gefxwarin ji hev dikare pitir derî ji ber lihevhatinê girêde. Ev yek jî dibe sedem ku çarenivîsa her sê dosiyayên girîng, wate ewlehiya keştîvaniyê di Tengava Hormozê de, kontirolkirina aloziyên herêmê û dosiyeya navikî, bikevin rewşeke aloztir û bê çaresertir de.



Encam: Siyaseta du-serî û pêvera rastîn a serkeftinê

Di dîtingeha zanista siyasî û di şiroveyên kiriyar û riftarên navneteweyî de, pêngava han li Waşîngtonê pitir ji vê çendê ku ji bo destkevtineke bingehîn be, dikare terzek ji “nîşandana hêzê” û sepandina zexta derûnî be ji bo guherîna hevsengiyê di qada danûstandinan de.


Di vî rengî de jî, ev riftar cihê metirsê ye û wekî siyaseteke “du-serî” tê hesibandin, ji ber ku her çend ku bikare aliyê hember neçar bike ku di riftar û siyasetên xwe de guhertinên ernî bike, bi heman rêjeyê jî hegera vê yekê heye ku bibe sedema xurtkirina helwestên tundtir ji aliyên baskên tundajo ve û pêvajoya danûsitandinan bo hertim asteng û dijwar bike.

Lê pirsa sereke eva ye ka gelo zexta ku ev riftara Waşîngtonê li Îranê dike, dê bikare bibe hegera lihevatin û çareserkirina pirsgirên hanê yan dê bibe sedema pevçûnên zêdetir di navbera her du aliyn de?

Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas



Beşa Heştem

Rojavayê Kurdistanê di Navbera Tengbûna Erdî û Tengbûna Qada Ramyarî de Îro rewş êdî ne wek berê ye. Rojavayê Kurdistanê ne li ber derfeteke firehbûna ramyarî ye, belkî li ber têkoşîna parastina ya ku hîn maye. Efrîn ji destê xelkê xwe derketiye û bûye birîneke vekirî di bin destê hêzên girêdayî bi projeya Tirkiyeyê de, hêzên ku rêveberiya Sûriyê ya demkî an ya veguhêz li ser wan desthilateke rastîn nîne. Serê Kaniyê, Girê Spî û deverên din jî nîşan didin ku armanca Tirkiyê ne.

ku armanca Tirkiyeyê ne ewqas avakirina “herêmeke ewle” ye, belkî zêdetir valakirina herêmê ji wateya wê ya Kurdî ye, bi guherandina nifûsê, bîranînê, desthilatê û zimanî.

Deverên ku hîn di bin bandora Rêveberiya Xweser de ne jî, di nav zextên leşkerî, ramyarî û aborî, û danûstandinên navneteweyî de tengav bûne, danûstandinên ku di wan de her tim ji Kurdan nayê pirsîn ka ew çi dixwazin, lê pir caran ji wan tê xwestin ku xwe li gorî daxwaza yên din biguncînin.

Ramariya Amerîkayê jî hatiye guhertin. Waşîngtonê ku bi QSD re wek hevalbendeke leşkerî di şerê li dijî DAIŞê de kar kir, nebû parêzvaneke rastîn a ramyarî ji bo mafên Kurdî. Hevalbendî zêdetir ya meydanê bû ji ya dûrnihêr, zêdetir ya ewlekariyê bû ji ya rewiştî, girêdayî şerê li dijî tîrorê bû, ne avakirina pêşerojeke dadmend ji bo Sûriyê.

Bi bilindbûna desthilata nû ya veguhêz li Şamê, ku rengê wê yê Îslamî-Sunnî eşkere ye, hesabên Amerîkayê dest bi guherînê kirin ber bi rêyekê din ve: dorpêçkirina Îranê û hêzên girêdayî wê, avakirina hevsengiyeke Sunnî ya herêmî, razîkirina Tirkiyeyê heta radeya ku hevsengiya berjewendiyan destûrê dide, û rêkxistina Sûriyeya nû wek qadeke bandorê ku dikare bê bikaranîn, ne wek welatek ku divê li ser bingehê dadmendiya dîrokî û hevpariya neteweyî û yasayî ji nû ve bê avakirin.

Li vir metirsiya herî mezin derdikeve pêş. Gava Sûriyeya nû li ser navendperestiyeke olî bê avakirin ku xwe bi gotareke gişti ya welatî veşêre, gava Tirkiyeyê qada berfireh ji bo bandorkirina biryara Sûriyê bê dayîn, û gava ji Kurdan bê xwestin ku bi hinek mafên çandî û rêveberî yên belav razî bibin, em ne li ber çareseriyeke welatî ne; em li ber vegerandina bi nermî ya heman siyaseta kevn a nasnekirinê ne.

Mafê çandî, heger li ser naskirineke bingehîn di yasa bingehîn de ji gelê Kurd, erdnîgariya wî ya dîrokî û mafên wî yên ramyarî re neyê avakirin, dibe xemilandineke zimanî di nav dewleteke navendperest de. Rêveberiya nenavendî jî, heger nebe beşek ji pergala yasayî ya zelal, dikare bibe tenê radestkirineke sînordar ku desthilat her dema bixwaze wê vegerîne. Herwiha, gotina li ser welatîtiya razber, gava di dewletekê de tê pêşniyarkirin ku bi bingehîn pirrengiya gel û neteweyên xwe nas nekiriye, dikare bibe amûra ji holê rakirina taybetmendiyan, ne parastina wan.

Ji ber vê yekê, Rojavayê Kurdistanê îro li ber demeke dijwar a venêrîn û nûxwendinê ye. Dirûşmên berê êdî têrê nakin. Herwiha, tenê girêdana bi navê Rêveberiya Xweser ve jî têrê nake, gava erd tengtir dibe, çavkanî tên ji dest derxistin, civak tê westandin, ciwan koç dikin û biryara ramyarî di navbera zexta derve û lawaziya hundir de belav dibe. Herwiha êdî ne pêkan e ji pirsên hundirîn dûr bikevin: Çima ezmûn nebû nimûneyeke aborî, karûbarî û perwerdeyî ya zêdetir balkêş? Çima lihevhatineke Kurdî ya firehtir nehat avakirin? Çima têkiliya di navbera hêzên Kurdî de di bin bandora hestyarî û berjewendiyên partiyan de ma, li şûna ku bi hişmendiyeke neteweyî ya Kurdistanî bê rêvebirin? Û çima dîtineke hevpar a yasa bingehîn nehat amadekirin ku berî her tiştî Kurdan razî bike, paşê bi Ereb, Suryanî, Aşûrî û pêkhateyên din re bi zimanê hevpariyê biaxive, ne bi zimanê tirsê?

Rexne li vir ne ji bo lawazkirina ezmûnê ye, lê ji bo rizgarkirina ya ku hîn dikare bê rizgarkirin e. Yê ku di dema tengbûnê de rexneyê red dike, ezmûnê ber bi korbûnê ve dibe. Yê ku parastina fedakariyan bi pîrozkirina şaşiyan tevlihev dike, xwînê dike perdeyek ku rê li ber venêrînê digire.

Rojavayê Kurdistanê îro ne pêdivî bi stranên zêdetir heye, lê bi hişeke ramyarî ya sar, wêrekiya rewiştî, yekîtiyeke Kurdî ya firehtir û dîtineke danûstandinê ku bizane çi nayê guhertin û çi dikare bê guhertin. Ya ku nayê guhertin ew e ku Kurd li Sûriyê gelekî resen in, Rojavayê Kurdistanê ne tiştekî nû li ser vê erdnîgariyê ye, û her yasa bingehîn ku vê rastiyê nas neke, dê yasa aloziyê bimîne. Ya ku dikare bê guhertin, şêwaza pêkan a ramyarî, rêbazên danûstandinê, sînorên hevalbendiyan û awayê veguheztina hêza leşkerî ya mayî bo sermayeke ramyarî ye, ne ku ew bibe barek ku li ser maseya danûstandinê bê bazirganîkirin.

Bi vê veguherînê re, Rêveberiya Xweser êdî ne tenê bi dijberên xwe yên kevneşopî re rû bi rû ye, lê herwiha bi sînorên ezmûna xwe ya hundirîn re jî rû bi rû ye. Salan nîşan da ku ewlekarî, tevî ku pêdivî ye, bi serê xwe nikare nimûneyeke aram ava bike, heger bi avahiyeke xurtir a karûbar, aborî û perwerdeyê re nebe yek. Civaka herêmî tenê parastinê naxwaze; ew derfetên kar, başbûna şertên jiyanê, avahiya bingehîn û rûmeta rojane dixwaze ku mirovan li hember veguherînên pêşerojê xurtir bike.

Girêk êdî tenê di zexta Şamê an Tirkiyeyê de nîne, ne jî tenê di bilindbûna rêbazên tûndrew di nav desthilata nû ya Sûriyê de. Ew gihiştiye lawaziya tevgera Kurdî di avakirina dîtineke hevpar û têr ji bo vê qonaxê de. Tevger îro li hember dijberên zêdetir rêkxistî, hawirdoreke navneteweyî ya kêmtir alîkar, û civakeke westiyayî ye ku nikare demeke dirêj di rewşeke leşkerî ya vekirî de bimîne. Ji ber vê yekê, her projeyeke Kurdî ku dixwaze bimîne, divê bikare parastin, yekîtiya ramyarî, karûbar, aborî û dîplomasiya rastgirtî bi hev ve girêde.

Berdewam dike...

Nerîna Lîderan



“Donald Trump”:

“Komara Îslamî êdî li herêmê hêz nîne û Amerîka di şer de pêşve diçe.û pêgeheke bilind e û parastî ye”



“benjamin netanyahu”:

“Rêjîma Îranê bo mana xwe şer dike û dê ji nav biçe”



“Marco Rubio”:

“Komara Îslamî gelek derfet ji dest dane ji bo gihîştina rêkeftinekê bi Amerîkayê re li ser bernameya xwe ya navokî.”



“Elî El-Zeydî”:

“Serokwezîrê Êraqê huşdarî da milêsên ser bi rêjîma Îranê li Êraqê got ku: berdewamiya kiryarên wan milîsan dikare desthilata netewî, aramiya Êraq û ewlehiya deverê rastî metirsiyan bike.”

Vekişîna Amêrîkayê dikare bibe destpêkek ji bo yêkgirtinê û serxwebûna Kurdistanê



N. Eskender Ceiferî



Vekişîna gav bi gav û dawî ya hêzên hevpeymaniyê navnetewî bi serokatiya Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê ji Êraqê, di hevkêşeyên siyasî û ewlehiyê yên Rojhilata Navîn de wekî xala guherînê ya dîrokî tê hesibandin. Ev bûyer, her çend di destpêkê de li ser valahiya desthilatê û zêdebûna gefên herêmî bibe sedema tirs û fikarê jî, lê stratêjiya li ser şert û mercên heyî nîşan dide ku ev guherîn dikare ji bo neteweya Kurd bibe derfeteke zêrîn û çarenûssaz. Ew derfet, ji bo derbasbûn ji girêdayîbûna hêzên dervayî herêmê û di hember de zêdebûna tevgera ber bi serxwebûnê ve, hevgirtina netewî û di encamê de pêkanîna armanca kevin a azadiya Kurdistanê.

Dîroka hevdem a Kurdistanê tijî evraz û nişîv e ku tê de baweriya bi soz û pişgiriya hêzên mezin ên cîhanê bêy hebûna hevgirtina Kurdan, di demên hestyar de bûye sedema bêbextî û paşvekişînê. Ezmûnê nîşan daye ku hebûna hêzên dervayî herêmê her dem li ser bingeha berjewendiyên jêopolîtîk rawestiyaye û her car ku guherînek di siyasetê de çê bûye, Kurdan zirarên herî mezin dîtine.

Vekişîna hêzên Amêrîkî ji Êraqê careke din ev rastiya bingehîn eşkere kir ku ewlehiya domdar û mafê diyarkirina çarenivîsê, nikare bi vîn û berjewendiyên neteweyên din ve bê girêdan. Bi dawîanîna hebûna leşkerî ya Amêrîkayê di herêmê de, wê fikra ku hebûna Herêma Kurdistanê tenê li ser sîwana piştgiriya Waşîngtonê ye betal dike. Ev merc, serkirde û aliyên cuda yên Kurdî neçar dike ku rastiya heyî bipejirînin: Tenê hevgirtina rastîn û xurt, vîna netewî û desthilata hundirîn a Kurdan bixwe ye ku dikare Kurdan rizgar bike.

Bi vekişîna hêzên hevpeymaniyê, Herêma Kurdistanê û hemû parçeyên Kurdistanê li beramberî astengiyên nû yên ewlehiyê û givaşên siyasî yên hêzên herêmî rawestiya ne.

Di vê navberê de, take çareseriya pratîkî ji bo rûbirûbûna gefan, avakirina hevgirtineke rastîn di navbera hemû partî, grûp û pêkhateyên civaka Kurdistanê de ye.

Nakokiyên navxweyî her dem astengiyên herî mezin li ser rêya gihîştina Kurdan ji bo armancên netewî bûne. Îro, pêdiviya yekxistina hêzên Pêşmerge, amadekirina stratejiyeke parastinê ya yekgirtî û bi dawîanîna rikaberyên partiyetî ji her demê zêdetir tê dîtin. Her lewma jî Başûrê Kurdistanê biryar da hêza Pêşmerge hev bigire û wekî leşkerê netewî û nîştîmanî li jêr biryar û desthilata Hikumeta Herêma Kurdistanê de be. Heke Kurdistan bikaribe hemû şiyanên xwe yên siyasî, leşkerî û civakî di bin sîwana hevgirtina netewî de rêxistin bike, ne tenê ti hêzeke herêmî nikare mafên wê binpê bike, belkî bingehên dewletek serbixwe û bihêz jî dê werin danîn.

Parastina rewa û piralî, hingê pêk tê ku hemû parçeyên Kurdistanê, bi fêmkirina mercên dîrokî, dest bidin destê hev û bingeheke parastinê ya hevpar ava bikin. Ev hevgirtin peyamek zelal ji hemû lîstikvanên herêmî û navnetewî re dişîne, Ew jî ev e ku Kurd hişyar û xwedî şiyan in ku ax û destkeftiyên xwe biparêzin.

Serxwebûna Kurdistanê, mafê dîrokî û take riya misoger ji bo ewlehiya domdar e. Ezmûna salên dawî di Eraqê û hemû herêma Rojhilata Navîn de xuya kiriye ku çarçoveyên siyasî yên heyî ne xwedî şiyan in ku mafên bingehîn û ewlehiyê yên Kurdan dabîn bikin. Heya dema ku Kurdistan di nav çarçoveyên şikestî û bêseqam de bimîne, her dem dê li beramberî gefên ewlehiyê, givaşên aborî û destwerdanên xirabker ên biyanî, lawaz be.

Êdî serxwebûna Kurdistanê ne tenê xewn e, belkî pêdiviyeke stratêjîk ji bo bi dawîanîna çerxên berdewam ên bêseqamî û zextê ye. Avakirina dewleteke Kurdî ya serbixwe, ne tenê mafekî xwezayî û dîrokî yê neteweyeke dehan milyonî ye, belkî dikare wekî faktorekê ji bo seqamgirî û hevsengiyê li Rojhilata Navîn kar bike. Dewletek li ser bingeha dêmokrasiyê, jiyana aştiyane û piştqahîm bi hêza parastinê ya herêmî, dê bikaribe pêwendiyeke hevseng û mentiqî bi hemû cîranên xwe re çê bike. Ev rêya ku li beramber me ye, dikare astengiyan veguherîne û bike derfeteke dîrokî.

Vekişîna hêzên Amêrîkî ji Êraqê nabe ku wekî gef an paşvekişîn bê dîtin, belkî divê mirov wê wekî destpêkek nû ji bo xwebaweriya netewî bibîne. Ev bûyer, xala guherînê ye ku dikare Kurdistanê ji girêdayîbûna bi yên din re ber bi avakirina desthilata netewî ve bibe.

Ji bo pêkanîna vê armancê, ev gav girîng û hewce ne:

-Yekxistina leşkerî û ewlehiyê ya hêza Pêşmerge

-Xurtkirina hevgirtina civakî û siyasî

-Pêşxistina şiyanên aborî yên herêmî

-Kêmkirina girêdayîbûna aborî û avakirina pêşesaziya domdar ji bo piştgirêdana bi çavkaniyên navxweyî

-Tevgerîna çalak ji bo dîplomasiya bihêz û serbixwe

Dîroka Rojhilata Navîn di nav guherînê de ye û hevkêşeyên kevn di nav hilweşînê de ne. Di vê navberê de vekişîna hêzên Amêrîkî ji Êraqê, Kurdistan xistiye ber ezmûneke mezin lê çarenivîssaz. Heke Kurd bikaribin van derfetan ji bo xurtkirina yekitiya navxweyî, rêxistinkirina hêza parastinê ya herêmî û rawestana li ser armancên netewî bi kar bînin, wê demê wê bikarin serbixwe bibin.

Pêşmerge, çemkekî girêdayî bi tevgera medenî–siyasî ya Kurd



N. Dr. Azad Mihemediyanî



Her car ku behsa Kurd û xebata dijî stem û cudakariyê tê kirin, berî her tiştî, tişta ku yekser tê xeyala beramberê nenas bi Kurdistanê re, şerê çekdarî û çemkê Pêşmerge ye.

Ev nêrîn bêsedem nîne û bi piştrastî paşxaneyeke derûnî û zihnî li pişta wê heye, ku dikare ji du goşeyên nêrînê ve li vê babêtê bê mêzekirin: Ji aliyekî ve, ev pêşdawerî belkî derketina beşek ji nasnameya xebata Kurd be ji bo bidestxistina mafên xwe yên neteweyî û mirovî, ji aliyê din ve jî, nîşandana nebûna têgihiştineke rast e ji mahiyyet û cewherê tevgera neteweyî–demokratîk a gelê Kurd, tevgerek ku di tevahiya dîroka hevçerx de, bi piştgirêdana bi qatên cuda yên civakê û bi amadebûna medenî û siyasî ya xwe, berdewam li beramberî desthilata sitemkar rawestiyaye.

Ev amadebûna medenî, ciwantirîn û bêwêneytirîn mînakên tevgera medenî û berevaniya neyînî li Îranê xistiye ber çavan. Gelê Kurd her car ku neçar bibe ji bo parastina xwe hawarê bibe ber çekan, hevdem ti carî ji rêbazên din yên xebatê xafil nebûye.

Ku wisaye, felsefeya hebûna pêşmerge û çeka destê Kurd, hewcedariya wê bi têgihiştineke hûr û giştgir di hemû rehendên xebata wî gelî de heye.

Di xwendineke dîrokî de ji bo sedem û çawaniya serhildana hêza pêşmerge wek rêxistinek an saziyeke yekgirtî û pêkhatedar, em dikarin behsa Komara Kurdistanê wek destpêka wê pêvajoyê bikin.

Dema Komar hat sazkirin, ev hikûmet ji bo çespandina desthilat û serwerî û dabînkirina nezm û ewlehiyê, wek her desthilateke din hewcehiya wê bi çêkirina hêzekê hebû ku hem şiyana şer hebe û hem di bin fermana birêveberiya siyasî ya Kurdistanê de erkên xwe cîbicî bike.

Bêguman çekdarbûn, bi ti awayî li Kurdistan û navçeyên din yên piştguhxistiye Îranê de tiştekî nû nebûye, di serdemeke ne pir dûr ji wê qonaxa dîrokî ya behskirî, li piraniya navçeyên Îranê de çek hem di destê xelkê de û hem di destê hoz û eşîretên cuda de bû.

Di rastiyê de karê ku Komara Kurdistanê kir, ew bû ku meseleya çek û hêza çekdar xiste nav çarçoveyeke rêxistinî û yekgirtiyeke sazî dayê de, hêzek ku diba di bin fermana serkirdayetiya siyasî de be, ji bo sepandina serwerî û parastina wê kiyana nû.

Piştî rûxana Komara Kurdistanê heta şoreşa gelên Îranê di sala 1979 a Zaînî de ji bilî qonaxeke kurt, ku serdemê Komîteya Şoreşgêrî 46–47 bû baldariya sereke hertim li ser xebata medenî û siyasî bûye, lewma zîndanên rêjîma Pehlewî tejî bûn ji xelkekî berfireh ê çalakên siyasî yên Kurd.

Hevdem li gel rûxana dîktatoriya Pehlewî, hêzên siyasî yên Kurd wek her hêzek berpirsiyar ku nûnertiya daxwazên neteweyî û dêmokratîk yên gelê Kurd dikirin, hêza pêşmerge ji bo cihgirkir aramî û nezm û ewlehiyê di wê valahiya siyasî ya ku hatibû holê de bi kar anîn.
Ev hêz tevî nearamî û ne-istiqrariya siyasî li Tehran û navendê de, karî bi awayekî serkevtî û bi bandor, hêmnî û ewlehî li navçeyên bin desthilata xwe de biparêze.

Lê belê bi sedema kiryarên têkderane yên hêzên Spaha Pasdaran û piştre derxistina fermana cîhadê ya Xumênî dijî gelê Kurd, ev pêkhat neçar bû wek hêzek şerker û cengawerên dilsoz bi armancên neteweya xwe meydandariyê bike, ev jî bersivdaneke sirûştî û rewa bû ku her neteweyek li beramberî destdrêjî, jînosîd û tawanan nîşan dide.

“Bi vî awayî, ev hêz di nêrîna giştî ya xelkê Kurdistanê de wek pişgir de fedaî li beramberî êrîşa hêzên dijî-mirovî yên desthilata olî, û hevdem wek pişgira hemîaliyane û manabexş a xebata medenî, rêz lê hatiye girtin û bilind tê nirxandin.

Heta di wan salen wê dawiyê de jî ku xebata çekdarî di pêşîniya kar de nebûye, mînakên bêhejmar hene ku xelk di meydana xebata girseyî de li ser şeqaman û li beramberî tundutîjiya desthilatê de, daxwaza alîkarî û piştgiriyê ji pêşmerge kirine, lê têgihiştina rast a dîrokî û rastbîniya serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê di van qonaxan de, biryar bi beşdariya çekdarî li şeqaman de nedaye û hertim rêya xebat û berevaniya medenî bi baştir zaniye.

Bi kurtî pirsa çek û hêza pêşmerge tenê diyarokekî leşkerî ya rût nîne, belkî yek ji stûnên piştgir yên gotara siyasî ya Kurd e ku berdewam mil bi milê gel çemkên din yên tevgera neteweyî–dêmokratîk, di berhemanîn mayende de ye ku pir ji xebata çekdarî berfirehtir e.

Pêşmerge niha çemkekî îlhambexş û yek ji bingehên pêkînerên wê gotarê ye, gotarek ku tê de ev hêz ne amrazê tundutîjî û herşeyê, belkî ji aliyekî ve peyamhênêrê azadî û aştiyê ye, û ji aliyê din ve jî piştgirekî cîhê baweriyê yê xebata medenî–siyasî ya civaka Kurdistanê ye, xebatek ku hêmn, li ser pê û hişyar ber bi paşeroja ve dihavêje.

Ciwanên Kurd di nav girtîgehê de, û mafê jiyana bi zimanê dayikê



N. Hesen Mukerem



Ciwanên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi salan e ku rastî zextên aborî, civakî û ewlehiyê tên. Ev zext ne tenê di qada gişti de, lê di jiyana rojane ya wan de jî xwe nîşan didin, ji dijwariya dîtina kar û dabînkirina lêçûnên jiyanê ve bigire heta sînordarkirinên civakî û tirs ji binçavkirinên ewlehiyê. Van şert û mercan bandor li ser xwendin, kar, têkiliyên civakî û hêviya wan ji bo pêşerojê kiriye.

Di salên dawî de, rewşa mafên mirovan li bajarên Rojhilatê Kurdistanê careke din bûye yek ji fikarên sereke yên rêxistinên mafên mirovan. Girtina çalakvanên medenî, çandî û siyasî, derxistina cezayên giran ên girtîgeh û îdamê û bikaranîna tohmetbariyên ewlehiyê li dijî hejmarek ji welatiyên Kurd, wêneyeke xemgîn û fikarbar ji rewşa mafên mirovan li van herêman nîşan dide.

Li gorî raporên salane yên rêkxiravên Mafê Mirovî, di salên dawî de hejmareke mezin ji welatiyên Kurd li bajar Rojhilatê Kuridstanê yên mîna Mehabad, Urmiyê, Pîranşar, Kamiyaran, Merîwan, Şino, Bokan, Seqiz û Bane û ... hwd hatine girtin, dadgehkirin an jî bi cezayên giran re rû bi rû bûne.

Di gelek bûyeran de girtî ji agahiyên zelal, hevdîtina bi parêzer û mafê parastina bi bandor bêpar tên hiştin.
10’ê Cotmehê, roja ku fikarên li ser îdamê zêde bûn

10ê Cotmehê di nav malbat û çalakvanên mafên mirovan ên Kurd de bi fikar û xem tê bîranîn. Ew roj e ku raporên li derheqê îdama du welatiyên Kurd, Mêhrab û Nasir, li girtîgeha Urmiyê belav bûn.

Malbat û rêxistinên mafên mirovan ragihandine ku ev her du kes di dosyeyekê de, ku ew wê weke bêbingeh û dûr ji dadweriya adil dibînin, bi îdamê hatine mehkûmkirin û biryara wan hatiye sepandin.

Dosyeya Mêhrab û Nasir careke din pirsên girîng li derheq pêvajoya dadwerî, destpêragihiştina wan a bi parêzer, awayê lêpirsînê û baweriya bi îtirafan derxist holê. Malbatên wan li ser vê baweriyê ne ku tohmetên li dijî van her du welatiyên Kurd hatine kirin bi rastiyê re li hev nayên û pêvajoya dadweriyê derfeteke parastina bi bandor û adil ji wan re nedaye.

Ev tenê yek mînak e lê di dosyeyên wiha de, berpirsiyariya desthilatdarên dadwerî tenê bi derxistina biryarê bi dawî nayê.

Divê bê zelalkirin ka tawanbaran mafê hebûna parêzerê serbixwe hebûye an na, ka dadgeh li ser bingeha sebebên bawerbar biryar daye an na û ka îtirafên gengaz bê zext û îşkence hatine wergirtin an na. Sepandina îdamê di şert û mercên ku bersiveke zelal ji van pirsan re tune ye de, fikarên mafên mirovan kûrtir dike.

“Piştî destpêka şerê Amerîka û Îsraîlê li dijî rêjîma Îranê li navçe û hûndirî welat, fikarên li derheq zêdebûna îdam û zexta li ser girtiyên siyasî û ewlehiyê zêde bûn û di vê heyamê de gelek girtiyên Kurd bi tohmetbariyên siyasî, ewlehiyê, hevkariya bi komên dijber an sîxuriyê hatine tohmetbarkirin.”

Ji ber ku gelek îdam bi awayeke nepenî tên sepandin û agahiyên fermî dereng an jî qet nayên belavkirin, berhevkirina hejmareke yekgirtî hêsan nîne. Lêbelê îdamkirina welatiyên Kurd bi rêjeyeke berbiçav zêde ne û ev rewş nîşan dide ku Kurd di dosyeyên siyasî û ewlehiyê de bi awayeke nehevseng rastî cezayên giran tên.

Yek ji fikarên herî girîng di dosyeyên girtiyên siyasî yên Kurd de awayê lêkolîna dadwerî û tohmetbarkirina weke «muharebe», «bexî» û «hevkarî an sîxurî ji bo dewletên biyanî» ye.
Ji ber vê yekê, dema ku malbat an rêxistinên mafên mirovan behsa «tohmetên çêkirî» dikin, divê pirsa bingehîn di mafê hebûna mafê parêzer, dadweriya vekirî û adil, derfeta parastina bi bandor û serbixwebûna pêvajoya dadwerî de bê lêkolîn.

Di dosyeya Mêhrab û Nasir de jî malbat û çalakvanên mafên mirovan tohmetên bêbingeh û dosyeyê dûr ji pîvanên dadweriya adil dizanin.
Zexta ewlehî û dadwerî tenê bi bajarekê ve sînordar nîne.

Li tev bajarên Rojhiltê Kurdistanê, gelek dosye li ser çalakiya medenî, çandî, siyasî û nerazîbûnên civakî hatine vekirin.

Urmiyê, weke cihê sepandina biryara îdama Mêhrab û Nasir, di salên dawî de gelek caran di raporên saziyên mafê mirovî de weke yek ji navendên girîng ên sepandina biryarên îdamê û girtina mirovên siyasî û ewlehiyê hatiye nîşandan.
Ev rewş bûye sedem ku gelek malbat, heta di wan bûyeran de ku tohmetbarên siyasî an ewlehî ne, bi mehan bê agahî li ser rewşa kesên xwe bê ageh bimînin.

Di gelek bûyeran de malbat ji mafê derstpêagihiştina bilez bi agahiyan, hevdîtin û agahdarkirina zelal li derheq pêvajoya dosyeyê bêpar tên hiştin.
Mêhrab û Nasir tenê du navên di nav rêzika dirêj a kesên hatine îdamkirin de nînin. Ew du mirov bûn ku malbat û nêzîkên wan hîn jî li ser pêvajoya lêkolîna dosyeyê û sebebên derxistina biryara wan pirsan hene.

Ji bo malbatên wan, 10’ê Cotmehê bîranîna roja ku sepandina îdamê derfetên bersivdanê û zelalkirina nezelaliyên dosyeyê ji holê rakir e.

Pirsgirêka ciwanên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê tenê bi hejmaran nayê ravekirin. Li piştî hejmarên girtin û îdamê pirsgirêkeke mezintir heye: mafê mirovan ji bo jiyanê, feydewergirtina ji dadweriya adil, azadiya derbirînê û parastina nasname û zimanê dayikê.

Ji bo malbatekê ku zaroka wê di girtîgehê de ye, ew tenê hejmarek di rêzika amarî de nîne; ew jiyanek e ku li benda vegera wî ye.

Rola Jinên Kurd di Parastina Çanda Kurdî û Beşdarbûna li Medyaya Civakî de



N. Sefiye Xalidî



Çand, berhevokek ji ziman, wêje, adet û kevneşopî, muzîk, cilûberg, bawerî, bîranînên dîrokî û şêwazên jiyanê ye ku ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin. Di nav gelê Kurd de, parastin û veguhastina van hêmanên çandî xwedî girîngiyeke taybet e, ji ber ku şert û mercên cûrbecûr ên siyasî û civakî di dirêjahiya dîrokê de bandor li ziman, nasname û mîrateya çandî ya Kurdan kirine. Di vê çarçoveyê de, jinên Kurd di warê parastin û veguhastina çandê de roleke girîng lîstine.

Beşdariya wan ne tenê bi hawîrdora malbatê re sînordar e, ew herwisa di warên civakî û çandî de, û di demên dawî de jî li qadên dîjîtal cih digirin, ku li wir beşdariyê di nûveberhênan, belgekirin û danasîna çanda Kurdî de dikin.

Bi berfirehbûna platformên medyaya civakî yên wekî Instagram, Facebook, YouTube û TikTokê re, awayên veguhestina çandê jî guherîne. Gelek jinên Kurd van platforman bi kar tînin da ku ziman, muzîk, cilûberg, xwarin, wêje, çîrok û kevneşopiyên Kurdî bidin naskirin. Bi vî awayî, medya civakî bûye qada pêwendiya di navbera nifşan de û herwisa ji bo danasîna çanda Kurdî li ber çavê temaşevanên li derveyî civakên Kurd. Îro, jineke Kurd dikare bi rêya vîdyoyek, wêneyek, nivîsekê, podcastekê an jî bernameyeke perwerdeyî, beşek ji çand û nasnameya xwe bi temaşevanên li seranserê cîhanê re parve bike.

Malbat yek ji wan hawirdorên destpêkî ye ku zarok tê de bi çand û nasnameya xwe re nas dibin. Jinan, bi taybetî dayik û dapîran, di gelek malbatan de roleke girîng di veguhastina ziman, çîrok, gotinên pêşiyan, stran û kevneşopiyên herêmî de lîstine.

Lorîkên kurdî, çîrokên gelêrî, rêbazên kevneşopî yên çêkirina xwarinê, merasîmên malbatî û hînkirina peyv û gotinên kurdî, mînakên wê yekê ne ku çawa çand di nav jiyana rojane de tê veguhestin. Ev pêvajo ne tenê veguhestina adet an jî kevneşopiyan e, herwisa beşdariyê di pêşxistina hesta aîdiyetê û girêdana bi rabirdû û civaka xwe re jî dike.

Ziman yek ji hêmanên herî girîng ên nasnameya çandî ye û jin di parastina zimanê kurdî de roleke girîng dilîzin. Bikaranîna kurdî li malê, hînkirina wê ji zarokan re, nivîsandin û weşandina berhemên bi zimanê kurdî û amadekirina naveroka perwerdeyî, di nav wan çalakiyan de ne ku dikarin beşdariyê di berdewamiya ziman de bikin.

Îro, hin jinên Kurd li ser medyaya civakî naverokên perwerdeyî yên têkildarî peyv, zarava, wêje û nivîsandina Kurdî belav dikin. Ev cure çalakî bi taybetî ji bo nifşên ciwan ên ku li hawîrdorên pirzimanî an jî li derveyî herêmên Kurdaxêv dijîn, dikarin gelek biqîmet bin, ji ber ku ew derfetê didin wan ku careke din bi zimanê malbata xwe û mîrateya xwe ya çandî re têkiliyê deynin.

Jin ne tenê di lixwekirina cil û bergên kevneşopî de, herwisa di sêwirandin, hilberandin û danasîna wan a ji bo girseyên berfireh de jî cih digirin. Parvekirina wêne û vîdyoyên cil û bergên kevneşopî li ser medyaya civakî, hişyariya wan zêde kiriye û hiştiye ku nifşên ciwan bi taybetmendiyên çandî yên herêmên cuda yên Kurdistanê re zêdetir bibin xwedî agahî.

Bi heman awayî, hunerên destan, karê derziyê, hûnandin û hunerên din ên kevneşopî ku li gelek malbatan ji aliyê jinan ve hatine parastin, niha dikarin bi rêya platformên dîjîtal ji girseyên berfirehtir re werin nîşandan.

Medyaya civakî astengiyên erdnîgarî bi awayekî berbiçav kêm kirine û ji bo çalakiyên çandî derfetên nû afirandine. Jineke kurd a ku li her dereke cîhanê dijî, dikare bi rêya vîdyoyek, wêneyek, çîrokek an jî peyameke nivîskî, beşek ji çanda xwe bi girseyeke berfireh re parve bike.

Ev çalakî nîşan didin ku parastina çandê êdî ne tenê bi pirtûk, dibistan an merasîmên kevneşopî ve sînordar e. Qadên dîjîtal jî bûne hawîrdorên girîng ji bo hilberandin, belgekirin û veguhastina çandê.

Jinên ciwan ên Kurd rêyên nû ji bo pêşkêşkirin û danasîna çanda xwe bi rêya amûrên dîjîtal pêş xistine. Ew dikarin hêmanên çandî yên kevneşopî bi formên nûjen ên wekî vîdyoyên kurt, podcast, wêne û naveroka perwerdeyî re bikin yek.

Ev yek bi taybetî girîng e, ji ber ku nifşên ciwan xwediyê têkiliyeke xurt in bi teknolojî û medyaya civakî re. Pêşkêşkirina çanda kurdî bi rêya formên dîjîtal ên hevdem dikare ji bo ciwanan derfetên nû biafirîne da ku bi mîrateya xwe ya çandî re têkiliyê deynin.

Di heman demê de, jinên Kurd ên li welatên cuda dijîn, dikarin medyaya civakî bikar bînin da ku têkiliyên xwe yên çandî bi civakên xwe re bidomînin. Ev têkiliya dîjîtal dikare bi taybetî ji bo malbatên koçber û nifşên ciwan hêja be, ji ber ku rê dide veguhestina ziman, bîranîn, kevneşopî û nirxên çandî bo nifşên pêşerojê.

Medyaya civakî ji bo parastin û danasîna çandê gelek derfetan peyda dike, lê di heman demê de hin zehmetiyan jî derdixe pêş. Yek ji van zehmetiyan, belavbûna agahiyên şaş an jî nîşandana çandên cihêreng ên civakên Kurd bi awayekî gelekî sadekirî ye. Çanda Kurdî li herêmên cûrbecûr, devok, şêwazên cilûbergan, kevneşopiyên muzîkê û adetên cihêreng dihewîne, lewma ev cihêrengî nikare bi tenê bi wêneyek an vegotinekê bi temamî were nîşandan.

Astengiyeke din jî xerckirina bilez a naveroka dîjîtal e. Piraniya naveroka ku li ser medyaya civakî tê parvekirin, ji bo demeke kurt tê temaşekirin û piştre zû ji bala bikarhêneran winda dibe. Lewma, belgekirin, rêkxistin û arşîvkirina naveroka çandî bi taybetî girîng e.

Ew jinên ku di qadên dîjîtal de çalak in, dibe ku rastî cureyên cuda yên zextên civakî, tundiyan werin. Afirandina jîngeheke ewle, bi rêz û piştgir dikare jinan teşwîq bike ku bi awayekî berfirehtir beşdarî çalakiyên çandî bibin.

Rola Mêran di Piştgiriya Jinan de wekî Aktorên Çandî Xurtkirina rola jinên Kurd wekî aktorên çandî, ne tenê bi hewldanên jinan bi xwe ve sînordar e. Piştgiriya malbat û civakan jî ji bo afirandina derfetên wekhev ên beşdarbûnê girîng e. Mêr dikarin alîkariyê bikin da ku jîngehek were afirandin ku tê de jin xwedî derfet bin jêhatîbûn û şiyanên xwe di çalakiyên çandî, civakî û medyayî de bi kar bînin. Hewce ye piştgiriya bi vî rengî li ser bingeha rêzgirtina li serxwebûn, bijarde û nêrînên jinan be, û rê bide wan ku derbarê cureyê çalakiyên çandî yên ku ew pê mijûl dibin û awayê derbirîna xwe de, biryarên xwe bidin.

Yek ji warên herî girîng ên piştgiriyê, malbat e. Mêr dikarin jinên malbata xwe teşwîq bikin ku zimanê kurdî fêr bibin û bi kar bînin, li ser wêjeyê bixwînin, beşdarî bernameyên çandî bibin û li ser medyaya civakî naveroka çandî biafirînin. Herwisa, beşdariya zêdetir a mêran di karên malê û lênêrîna zarokan de dikare dem û derfetên zêdetir bide jinan da ku di çalakiyên çandî, civakî û medyayî de cih bigirin. Dabeşkirina adilane ya erkên malbatî faktoreke girîng e ji bo ku jin bikaribin bi awayekî çalakir beşdarî civakê bibin.

Mêr dikarin bi danasîn û parvekirina berhemên jinan, piştgirîdana nivîskar, hunermend, lêkolîner û afirînerên naverokê yên jin, û herwiha bi beşdarbûna di projeyên çandî yên hevpar de, piştgiriyê bidin çalakiyên çandî yên jinan li qadên dîjîtal. Di vê çarçoveyê de, girîng e ku mêr li şûna biryardana li ser navê jinan, wekî hevkar û piştgir tevbigerin û rê bidin jinan ku ew bi xwe cure û şêwazê çalakiyên xwe yên çandî diyar bikin.

Warên din ên girîng, afirandina jîngeheke ewle ji bo jinan li ser medyaya civakî ye. Jinên ku li ser înternetê çalak in, dibe ku rastî heqaret, gef an jî darizandina civakî werin. Mêr dikarin bi dijberîkirina van cure tevgeran û pêşxistina diyaloga bi rêz, beşdariyê di afirandina jîngeheke ewletir de bikin. Piştgiriya jinan li ser înternetê divê ne wateya sînordarkirina hebûna wan be, berevajî vê, divê tê wateya afirandina şert û mercên wiha ku ew bikaribin bi awayekî azad û berpirsiyarane nêrîn û xebatên xwe yên çandî bînin ziman.

Mêr jî dikarin rasterast beşdarî parastina çanda kurdî bibin. Jin û mêr dikarin bi hev re ji bo tomarkirina dîroka devkî, parastina muzîk û wêjeyê, danasîna cil û berg û xwarinên kevneşopî, amadekirina naveroka perwerdeyî û tomarkirina bîranînên nifşên mezin bixebitin. Hevkariyeke bi vî rengî nîşan dide ku parastin û pêşxistina çanda kurdî berpirsiyariyeke hevpar e û nabe ku tenê li ser milê jinan an jî mêran were hiştin.

Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

Di 9 mehên derbasbûyî de, herî kêm 70 girtiyên siyasî hatine bidarvekirin




Rejîma Îranê li nerizatiyên meha Befranbarê ve heya niha, aliyê kêm 70 girtiyên siyasî bidar vekirine ku aliyê kêm nivya wan li pêywendî ligel wan nerizatiyane de hatine sizadan.
Herwisa 194 kesên din jî bi gefa bidarvekirinê de ne ku , 113 kes ji wan girtiyên nerizayetiyên Befranbarê ne.
Di wî heyamî de 35 kes li dosyeyên peywendîdar bi nerizatiyên meha Befranbarê, 9 kes li dosiyên peywendîdar bi şerê 12 roje û 40 roje, û 26 kesên din jî li dosyeyên siyasî û îdolojiyên cuda de hatine bidarvekirin.
Bidarvekirina girtiyên siyasî di wî heyamî de di halekê de zêdetir bûye ku girtin û çêkirina dosyê bo salên berê, wek nerizatiyên şoreşa Jin Jiyan Azadî heya digehe wan dosyên ku tohmetbar nêzî 9 salan li girtîgehê de bûn.
Herwisa Rêkxirava Mafê Mirov a Îranê heya 11ê Rezberê, bidarvekirina 35 kesan li peywendî ligel nerizatiyên meha Befranbarê tomar kiriye.
Herwisa li wê rêjeyê, 13 kes bi tohmeta hevkarî yan endametî li hizb û rêkxistinên opozisyonê de hatine bidarvekirin, 9 kes bi tohmeta peywendî ligel Rêkxirava Mucahidîn a Xelik, du kes bi tohmeta peywendî ligel Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û çar kes bi tohmeta endametî li girûpên olî de, pêşîneya wan dosiyan dizivre bo pêş nerizatiyên meha Befranbar û du şerên wê dawiyê.
Hevdem 7 kesên din jî bi tohmeta sîxûriyê hatine bidarvekirin.
Li koma wan 194 girtiyên siyasî de ku metirsiya cîbicîkirina sizaya bidarvekirinê li ser e, 13 kes jin û 7 kes jî zarokên jêr temen 18 saliyê ne.

Rêjîma mirovkuj 2 girtiyên din ên siyasî bidar vekirin



Li gorî çavkaniyên rêkxistin û saziyên mafê mirovan,komîteya azadiya girtiyên siyasî, sibêdeha îro roja duşemê 13ê Rezberê, Elîreza Spahî û Elîreza Reîsî, du kes ji girtiyên xwenîşandanên gişti yên meha Befranbara 1404an, li girtîgeha Dastgird a Îsfahanê hatine darvekirin.
Ev nûçe ji aliyê Şahbaz Wekîlî, parêzerê Elîreza Spahî di qonaxa ji nû ve darizandinê de, li ser hesaba wî ya Instagramê hat ragihandin. Wekîlê wî diyar kir ku tevî pejirandina daxwaza ji nû ve dadigehîkirinê û pêdaçona bi dosyeya wî, Dadgeha Inqilabê ya Îsfahanê bêyî çêkirina civîna dadgehê û di kêmtirî 48 demjimêran de ev daxwaz red kiriye.
Çalakvanên mafên mirovan di meha dawî de gelek caran hişyarî dabûn ser eger û metirsiya darvekirina van her du kesan.
Dosyeya bi navê “Meydana Elîxanî” ku girêdayî xwenîşandanên 18ê Befranbarê ye, ji destpêkê ve bi nerazîbûna li ser riya darizandinê, dadgehkirina giştî û veşartî, û êtirafvergirtina bi zorê re derketibû holê. Komara Îslamî îdîa dike ku di wê bûyerê de çar endam û Basîc hatine kuştin.

Rejîma Îranê girtiyekî din ê nerizayetiyên meha Befranbarê bidar vekir




Li gorî rapora ajansa nûçeyan a Mîzanê, ku girêdayî dezgeha binav dadweriya rêjîma Komara Îslamî ye, roja Şemî 11ê Rezberê ,cezaya darvekirina Siyaweş Cemşîdî Xeyrabadî yek ji xwenîşanderê meha Befranbarê li bajarê Şehrê Kurd, piştî pejirandina hikmê bidarvekirina wî ji aliyê Dîwana Bilind a Rejîmê, îro hate bidarvekirin.
Gorî tohmetên dezgeha dadwerî û dadigeha rêjîmê, Siyaweş Cemşîdî di dema xwepêşandanên meha Befranbara sala borî de bi çekan teqe ji polîsan kiriye û du roj piştî vê teqekirinê bi çekê ve hatiye girtin.
Mîzan îdia kiriye ku ew “yek ji şerûdên pile yêk yê Şehrê kurd” bûye û xwepêşandanên Befranbara 1404 wek “kudeta” binav kiriye. Herwisa tohmetên weke sextekariya aborî, gef, dizî, çekdarbûn û beşdarbûna di revandina xelkê de bi ser navbirî de sepandiye.
Dadgeha rêjîmê bo piştrastkirina van tohmet û îdîayan ti belgeyek berbiçav belav nekiriye. Herwisa, tu zaniyariyek li ser pêvajoya dadweriyê an jî hebûna parêzerê hilbijartî re nehatine belavkirin.
Eva sêyemîn darvekirin e ku di hefteya borî de li derheq xwepêşandanên meha Befranbarê de hatiye ragihandin.

Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (527)

PDKI



DÎPLOMASIYA REVÊ !

Pişteder kirina Şanda Rejîma Îranê Li New Yorkê

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê - Navenda Ragihandinê